



## Futbol (tepa pê)



Bîst û du lîstikvan di lîstikgehê dane û li ser du tîma di dabeşkirî ne. Tîmek hêrişê dike, ya di berevanîyê dike û tepe ji dev lîstikvanekî diçe dev êkê di. Ji nişkekê vî tora gola tîmekî diheje û golekan tê tomar kirin. Eve dimenekê lîstika futbolê ye, ku êk ji cewawertirin corên werzişê ye li hemu cîhanê. Li roja (26/10/1863)ê serokên (11) yaneyên futbolê, yêkemin yêketîya futbolê di dirokê da, damezirandin û peyrewek û destûrek bo danan. Piştî demekê kêr ev lîstik ye li Ewropa hemuyê belavbû. Di sedsalîya bîstê da geheşte kişwerên di û niha li hemu cîhanê lîstika yekeme. Lîstika futbolê (90) deqîqeyan vedikêşe û ev deme li ser du nivên hindî yek tê dabeşkirin. Di futbolê da du tîm dikeve ber yek ku her tîmek digel golçî ji yazde lîstikvanan pêktê.



Di nav lîstgehê da, dadvanek bi harîkariya du zêrevanên hêlê bi rêvebîma lîstikê radibin. Dadvanê çarê bi karê guhurîna lîstikvanan radibe. Di lîstikyên dew lî da her tîmekê mafê guhurîna sê lîstikvanan bi tenê heye. Futbol, her wekî ji navê wê diyare, bi pêyî tê kirin û ji golçî pêvetir çê nabe kes tepê bi destî bigre

Ew jî di nav devera penertîyê bi tenê da. Di sa dema lîstikvanek tepê di-havêje ji derve, lîstikvanekê tîma di tepê bi her du destan davêje gorepanê da. Lê eger tepe di ser hêla golê ra çû ji derve, eve lîstikvanekê tîma di, dê bi pêyî tepê ji kujîyê lîstgehê davêje di gorepanê da.



Di lîstikyê da faul hene û faul dihêne cezadan û cezayê ji hemuya mezintir penertî ye.

Her wesa eger lîstikvanek reftareka kirêt di lîstikyê da bike yan dê karteka zer werbigre yan jî ya sor û hîngê dê ji lîstikê hête derxistin. Her tîmeka pitir gola bike ew dê bi serkeve û di gelek lîstikan jî da her du tîm wekhev derdkev-





## Yaneyê Zaxoyê

Yaneyê Zaxowê li sala 1978ê hatîye dameziran-din û ji hîngê were ya berdewamê li ser beşdarîkirinê di xol û qaremanîyên 'êraqê û herêma Kurdistanê da. Niha çendîn lîstik li vê yaneyê dihêne kirin wek futbol, vûlîbol, baskêt, karatê, buksanê, takwandu û melevanîyan. Di vê yaneyê da tîmên kiç jî hene û lîstikên baskêt, vûlîbol û pîng ponê dîken.



Di vê yaneyê da gelek werzişvanên çeleng serhildaye, wek, şêrku Elî ku di leşcuwanîyê da, Remezhan Derwêş di bilindkirina asnê da, Re'ed Mihemed di xwelêkdanê da, Rengîn Hisên di lîstika baskêt û vûlîbolê da. Van lîstikvanan di nav rêzên helbijartîyên 'êraqê da û di qaremanîyên 'Erebî û Asîya da lîstik kirîye û encamên baş bi dest ve înayne. Baştirîn deskeftên vê yaneyê, derbasbûna tîma futbolê li werzê 2003 bo xola Nayab bû. Her wesa derbasbûna tîma tîpa destî li werzê 1995-1996ê bo xola pîla yekê zêdebarî tîma xwelêkdanê ewa çendîn salan li dîw yek konitrol li ser qaremanîyên 'êraqê kirîye.

## Li dîdara Kepirê

### Mihemed Abdulbasit



Mihemed yek ji lîstikvanên zîrek û çelenge di nav tîma yana Dihokê ya karatê da. Li sala 1992ê ji dayik buye û niha qutabî ye li pola çarê, amadeya çîya li Dihokê. Mihemed dibêje: "Min li sala 1991ê dest bi rahênanên vê lîstikê kir û heta niha ezê berdewamim. Yê ku ez han-dayim ji bo vê lîstikê kurê xalê min (Hindirîn Mes'ûd) bû ku lîstikvanekê karatê ye." Mihemed li rêza yekê ye li ser bajêrê Dihokê û li sala (2005)ê li rêza yekê li ser astê herêma Kurdistanê derketîye. Sê salan li ser yek di qaremanîya zarokên jî yê deh salî û wêve da li rêza yekê buye.

Ji bilî werzişê hej xwandin û guhdarîya sitran û muzîkê dîke.

Mihemed ji bilî ku di werzişê da qaremane di xwandina xwe jî da qutabîyekê serkeftî ye û ji ber hindê jî dayk û babên wî piştevanîya wî dîken. Mihemed hez dîke bibe evser di pêşerojê da. Li dûmahîyê sipasîya Kepirê dîke û daxwaz dîke ku Kepir pitir pîte bi werzişê bike. Em daxwaza serkeftinê bo Mihemedî û hemu zarokên Kurdistanê dîkin.